



# KNK Bulten

Bultena Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê \* Hj.: 4 \* Kanûn 2007

## Rêberê KCKyê Abdullah Ocalan:

**“Ez ji bo Kurdan Otonomîya Demokratîk ya Kurdistanê pêşniyar dikim.”**

[Dûmahîk di rûperê 9ê da ye.]

\* \* \*

## Dijminê sereke û reftara neteweyî

Bi êrişa 16ê Kanûnê ya hewayî ve careke di ron bû ku di rêza dijminan da rola sereke ya dewleta Tirk e. Helbet Îran jî wekî mîratxwera Împaratorîya Farisan kêmî mîratxwera Împaratorîya Osmanîyan Tirkîyeyê nîne. Hindî Sûrîye ye, ew kunika zirneyê ya dûmahîkê jî be her dijmin e. Iraqa berê nemaye û di şertên îro da relatîven jî be, ji ber cepheyê mezin yê anti Kurd vebûye, belê şovenîzma Erebi ya salan hêj jî di polîtîka Iraqa nû ya Federal da dom dike û di nav xwe da potansiyela anti Kurdistanîyê jî diparêze. Lê belê, di vê ekûasyona dewletên kolonyalist da rola sereke û organîzator ya Tirkîyeyê ye ku eve di pratîka van salên dawîyê da zelaltir bû. Tirkîye wekî şefê orkestrayê, dijayetiya van dewletên kolonyalist organîze dike û di nav ahengekê da mobilîze dike. Li pişt hemû tifaqên anti Kurd yê van dewletan Tirkîye heye. Tirkîye di nav van dewletan da jî ya herî xwerû anti Kurd û anti Kurdistan e. Dewleta Tirk hind bêperwa ye ku tehemmula navê Kurd û Kurdistanê nake. Tirkîye ji bo vê polîtîka xwe ya anti Kurd û anti Kurdistan hazir e hemû serûbinîyan bike, xwe bi hemû awayan pêşkêş bike!. Di polîtîka dewleta Tirk ya beramberî xelkê Kurd da çu norm nînin û bi pratîka xwe ya salan jî eve nîşan daye. Tirkîye hemû têkilîyên xwe yê navneteweyî jî li ser bingehê anti Kurd û anti Kurdistanîyê vedihûne. Dewleta Tirk dijî xelkê Kurd hemû mekanîzmayên xwe, hemû hêz û şîyanên xwe seferber kirine û ji êrişên leşkerî û şiddetê pêve tişteke nake. Dewleta Tirk esasen hêza xwe ya sivil jî bi metodên şerê psikolojîk û manipulasyonêke kûr dijî Kurdan organîze dike.

Di dawîya sala 2007an da hate dîtin ku piraniya xelkê Tirk jî dakete kuçe û kolana û sloganên qehra Kurdan avêtin û piştevanîya ertêşa xwe kirin. Hukûmeta Teyîb Erdogan jî xwe masîkî avête navê pêla nijadperês û xwe kire parçeyekî konseptê ertêşa ku didanên xwe bo wan jî diçîrikîne. Ertêşa Tirk bi navê xelkê xwe yê şerxwaz û bi destek û direktîva hukûmeta Erdogan û piraniya parlamenta Tirk ev êrişa 16ê Kanûnê pêkîna. Dewleta Tirk bi vê kiriyara xwe timamî xelkê Kurd kire armanc û mesaja xwe bi aşkerayî û bi bombeyên jahrîn da ku ew dê anti Kurdîti û anti Kurdistanîtiya xwe bidomîne. Êrişa wan herçend 5 gerilla û du gundî kuştibin jî, şik têda nîne ku ji aliyê leşkerî ve fiyasko bû. Belê vê êrişê dubare zelal kir ku dewleta Tirk di dijayetiya xelkê Kurd da tixûban dide zorê û di şer û birandinê da bi îsrar e. Bombeyên wan bi nîveka Kurdistanê ketin. Zerar û zîyaneke mezin dan ku ji xwe ve yêkê dikin. Bo wan Kurd dijmin e û Kurdistan nîşangeha bombeyan e. Çi li başûr, çi li rojhilat, çi li başûrarojava û çi li bakur û hetta Kurdên diasporayê, ferq nake, li her derê vê dijminahîya xwe didomînin. Beramberî vê reftara dewleta Tirk yêk rê heye bo hemû Kurdan; dijî dewleta Tirk nekevin nav sistî û hesabên pûç, vala û bêbin!

Beramberî dijminê birandêr çî hewce be divê ew bête kirin ji teref Kurdan ve. Dewleta Tirk neyar e û hem jî neyarekî xedar e. Kurd divê bi bîr û bawerîyeke saxlem ya neteweyî, li goreyî vê neyarîya dewleta Tirk pozîsyona xwe kîvş bikin û heta ku wan mecbûrî ser maseyê dikin, polîtîka xwe ya maqûl û radîkal bidomînin!. **RH**

# Daxuyanîya Konseya Rêvebir ya KNKYê

Pêşhatinên li rojhilatanavîn, têkilîyên di navbeyna dewletên navçeyê û pozisyona Tirkîye û Iranê, serdanîya serokwezîrê Iraqa Federal, Malîkî, ji bo Tirkîye û Iranê, nîşaneyên pêleke nû ya êrişkarîya li ser Kurdistanê ne. Tirkîye direkt û aşkera koordînatîya vê konseptê nû dîke. Tirkîye daku Iraqê tevî planê xwe yê nû bike, politîka destabilîzasyonê li nav Iraqê dimeşîne û car direkt bi destê ajanên xwe, carna jî bi destê taşeronên îslamîst êrişên hovane dîke û dide kirin û li her derê Iraqê bombeyan dide peqandin. Li ber vê politîkayê şik têda nîne ku ew êriş li ser Şengala Kurdistanê pêkhatî jî direkt îndirekt bi organîzatorîya Tirkîyeyê hatiye kirin. Tirkîye bi van kiryanan dixwaze hukûmeta Iraqê bike nav devê meqesê û mecbûrî xwe bike. Serdanîya Malîkî ya Tirkîyeyê û îmkîrîna “Muhtiraya Mutabeqet”ê dide nîşan ku Tirkîye di nav entîrkayên nû da ye. Em vê “Mutabeqeta Malîkî û Erdogan” lihevhatîneke bêyûm, antî Kurdistan û şerxwaz dibînin û şermîzar dîkin. Herweha em hukûmeta Iraqê jî hişyar dîkin ku nekeve nav dava dewleta Tirkîyeyê û ji bir neke ku bi desteka koalîsyona digel partîyên Kurdistanê li ser kar e û hevkarîya digel dewleta Tirkîyeyê huzûrê nayîne Iraqê, bereks dê krîza Iraqê kûrtir bike.

Iranê cepheyekî nû yê şer vekirîye û hem li ser tixûb, hem jî li rojhilat, ji erd û ji hewayî Kurdistanê bombe dîke. Gerîllayên PJAKê di nav berxwedaneke xurt da ne beramberî van êrişên Iranê. Tirkîye jî hemû alîyan ve destekê dide Iranê û bi koordîne vî şerî didomînin. Ev operasyonên ji cepheyê rojhilat û bakur ve hatine dest pê kirin, digel parçeyên rojhilat û bakur yê Kurdistanê, tehlîkeye direkt li ser Kurdistana Federal jî dîkin. Lewma ev konseptê nû ya Tirkîye û Iranê li ser gîştî bizava neteweyî ya Kurdistanê tehlîkeye nû pêktîne. KNK giring dibîne ku hemû hêzên neteweyî yê Kurdistanê vê tehlîkeyê ciddî bigirin û ji bo rê li ber girtinê, tedbîran bi hev ra bistînin. Dewleta Tirkî di nav tixûbên xwe da û li seranserê bakura Kurdistanê jî bi çekên herî giran operasyonên xwe didomîne û bi bombeyên sojer Kurdistanê kavil û wêran dîke. Di kuştina gerîllayên HPGyê da tête dîtin ku Tirkîye bombeyên kîmyayî jî bi kar tîne. Beramberî şerê ku ji teref Tirkîye û Iranê ve tête domandin, pêvîstîya tifaqa neteweyî îro ji her demî lezîntir e. KNK bangî hemû hêzên neteweyî dîke ku rojek zûtir pîrs û pîrsgirêkên navxweyî çareser bikin û hêmu enerjîya xwe beramberî dijmin seferber bikin.

KNK êriş li ser Şengalê dubare şermîzar dîke, serxweşîyê dide malbatên şehîda û ji bo brîndaran şîfa xêrê daxwaz dîke û ji timamî neteweyê Kurd jî dixwaze ku destê hevkarîyê dirêjî birayên Kurd yê Êzîdî bikin. Herweha KNK hêvî dîke ku hukûmeta Kurdistana Federal û hemû hêzên neteweyî ji bo parastina Kurdên Êzîdî çî hewceyê bikin.

Lê Ilonê roja aşîyê ya cîhanê ye û Kurdistan di nav agir da ye. Dewletên dagîrker her roj bi êrişên kujer û sojer aşîyê qetîl dîkin. Em bangî cîhana humanîter, demokratîk û aşîxwaz dîkin ku Kurdistanê û xelkê Kurd bi tenê nehêlin û ji bo pêkînana aşîyêke dadyar hevkarîya xelkê Kurd bikin. Xelkê Kurd têkoşîna xwe ya ji bo azadî û wekhevîyê, bo aşîyêke dadyar didomîne. Bi vê armancê Kurdên dîasporaya cografyaya Yêkîtiya Ewrûpayê li Elmania bajêrê Gelsenkirshenê Festîvala Navneteweyî ya Kultura Kurdî pêktînin û Festîvala îsal jî dîyarî şehîdên Şengalê hatiye kirin. KNK bangî Kurdên cografyaya Yêkîtiya Ewrûpayê dîke ku bi boşahîyêke mezin beşdarî vê Festîvalê bibin û dengê azadîyê, dengê wekhevîyê, dengê aşîyêke dadyar bilind bikin û bi vê hêza xwe ya mezin û yêkgirtî timamî êrişên dijminan rûrêş û şermîzar bikin û piştevanîya xwe nîşanî birayên Kurd yê Êzîdî bidin.

KNK bangî hukûmeta Iranê dîke ku îdama rojnamevanên Kurd bide sekinandin û rojnamevanan berde. KNK herweha bangî cîhana humanîter û demokratîk jî dîke ku piştevanîya rojnamevanên Kurd yê li Iranê girtî bikin ku dewleta Iranê dixwaze wan îdam bike.

**Konseya Rêvebir ya KNKYê  
31 Tebax 2007, Bruksel**

\*\*\*

## Prosesa yêkkirina KNK û Kongreya Gel

KCKyê di mesaja xwe ya ji bo kombûna mezin ya KNKYê [23-24ê Hezîranê] şandî da teklîfa yêkkirina KNK û Kongreya Gel kiribû. Di mesaja KCKyê da wisa dihate gotin:

“... Di pêvajoyeke wisa da, ku li Rojhilatanavîn û Kurdistanê pêşveçûnên germ tene jîyan û ev hemî pêşveçûn jî bi sîd wergirtina gelê Kurd da ne, em pêkanîna 7. Civata Gîştîya KNKê watedar dibînin. Lewma di vê qonaxa giring ya dîrokê da, em difikirin ku dê KNKê di vê civîna xwe da, di warê ji nû ve rêxistinkirin û bilindkirina têkoşînê da, biryarên giring bigire.

Em bawer dîkin ku dê rojeveke were dîyarkirin li ser bingehê bangewazîya serok APO ya ji bo yekbûna KNK û Kongra-Gel. Em difikirin ku rojeveke bi vî awayî, dê him guftûgoyan kûrtir bike û him jî dê bibe bersiv ji bo zêdetir sazîbûnê û pêdivîyên ku vê pêvajoyê ji me dixwaze...”

Li ser vê daxwaza KCKyê, kombûna mezin ya KNKYê erkê berpirsiyarîyê da konseya rêvebir ya KNKYê ku hem

bersiveke pozîtîv bide KCKyê, hem jî wezîfeya prosesa yêkkirinê bîne cih. Piştî vê berpirsiyariyê, konseya rêvebir ya KNKYê teklîfa yêkkirinê maqûl dît û ji bo ku proses bête dest pê kirin nameyek bo konseya rêvebir ya KCKyê şand. Piştî nameya KNKYê, KCKyê daxwaza danana du komisyonan ya KNKYê qebûl kir û du komiyon hatin tesbît kirin ku pîrsa yêkkirina KNK û Kongreya Gel zelal bikin. Vê gavê prosesa yêkkirinê tete vehûnandin û di demekî maqûl da encam dê bête aşkera kirin. Nameya konseya rêvebir ya KNKYê li jêr e:

# Bo Konseya Rêvebir ya KCKyê,

## Hevalên hêja,

KNKYê kombûna xwe ya mezin di 23-24ê Hezîranê da pêkîna. Mesaja we ya ji bo kombûna mezin şandî hêzeke mezin da kombûnê û bi giştî KNKYê. Herweha bi navê konseya we hevalê hêja Murat Karayilan ji bo »14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî« jî mesaja piştgiriyê şandibû û bi vê destek û piştgirîya we, pîrozîya «Cejna zimanê Kurdî» ya ku KNKYê daye dest pê kirin, bi serkevtî bofî û ji teref neteweyê Kurd ve bi dilgermî hate qebûl kirin û bi coş û heyecaneke mezin hate pîroz kirin. Em wekî konseya rêvebir ya KNKYê, bi navê hemû endaman û timamî hissîyata neteweyî ya xelkê Kurd ji dil spasî we dikin. KCKyê wekî sîstem, ji destpêka damezrandina KNKYê heta îro bi hemû hêz û şiyana xwe ve piştgirîya KNKYê kirîye, hemû îmkânên xwe dayne xizmeta KNKYê. Ji ber vê fedakarîya we jî em spasên herî ji dil pêşkêşî we dikin.

## Hevalên hêja,

Hûn jî dizanin ku bi giştî organîzasyon ji hewcehîyên sosyopolîtîk, sosyokultûrel û sosyoekonomîk derdikevin. KNK jî bi hewcehîya pêkînan û seferberkirina hemû hêz û enerjîya neteweyî hatîye damezrandin. Esasen hêza sereke ya ku pêşengîya damezrandina KNKYê kirî jî tradîsyona KCKyê ye û neteweyê Kurd vê yêkê baş dizane û bihayekî mezin dide vê rola tradîsyona pêkve sîstemê KCKyê. KNKYê ji roja ku hatîye damezrandin heta îro kêr zêde kar û xebat ji bo yêkîtiya neteweyî kirine. Lê belê, hûn jî dizanin ku karê herî zor û zehmet yê di nav Kurdan da pêkînan yêkîtiya neteweyî ye. Digel vê yêkê jî, bi desteka we hindêk kar û xebat hatine kirin û

qet nebe şûra pêdivîya lezîna ya bi yêkîtiya neteweyî, di serê mirovê Kurd da hatîye jînde kirin. Belê, pêşkevîna rêxistinê ji alîyêkê ve bi konjonktûra navxweyî û derve jî girêdayîye. Lewma, heta îro digel hemû hewildanên pozîtîv, di çar parçeyên Kurdistanê da yêkîtiyêke ku tete xwastin, yêkîtiyêke ku hemû dînamîkên Kurd teta cih bigirin mixabin pêknehatîye. Hewceyî dubarekirinê nîne û hûn binasên [sebeb] vê yêkê dizanin. Qonaxa ku şoreşa Kurdistanê hatîye, hewcehîya yêkîtiyêke neteweyî ya kamil ji her demî zêdetir elzem dike, belê subjektîvîzm û egoîzma ferdî û rêxistinî hêj jî astengên herî mezin in di rêya vehûnandina yêkîtiya neteweyî da. Helbet ev astengên heyî divêt xwastin, hewildan û hewesa pêkînan tifaqa neteweyî neşkêne, lê axir di halê hazir da objektîven ev barîyer jî di rêya avakirina yêkîtiya neteweyî da hene. Digel vê realîteyê jî, em di wê bawerîyê da ne ku divêt kar û xebatên ji bo pêkînan yêkîtiya neteweyî ya herî fireh bêyî rawestîna bêne domandin. Em ji pratîka we ya pozîtîv ya di vî warî da baş dizanin ku hûn wekî rêxistin her gav di pêkînan yêkîtiya neteweyî da aktîv bûne û hêj jî vê rola xwe ya çêker didomînin. Pîrsa yêkîtiya neteweyî divêt di serê rojeva hemû Kurdan da be û em hêvî û tikayê ji hemû dînamîkên neteweyî dikin ku di avakirina yêkîtiya neteweyî ya herî fireh da çî fedakarî hebin bêne kirin. Şkandina cepheyê dijmin, pêşxistina hêza mezin ya neteweyî, parastina destkevtan û di encam da serkevtina bi giştî ya neteweyî, bi yêkîtiya mezin ya neteweyî û seferberkirina hemû dînamîkên neteweyî ve mumkun dibe.

## Hevalên hêja,

Hûn jî baş dizanin ku rêxistin di prosesa têkoşînan da ne armanc in, alet in. Aletên têkoşînan çu caran ne tabû ne, ne dogma ne û divêt li goreyî dem û şertan û hewcehîyên têkoşînan bêne nûve kirin, bêne guhorîn, bêne teqwiye kirin, bêne reforme kirin û lêgerînên di pêşxistina organîzasyonan da bêyî rawestan divêt bêne domandin. Xaseten di nav organîzasyonên sihwane yê neteweyî da divêt prosesên reformasyonan li goreyî hewcehîyan neyêne texîr kirin, di dem da bêne kirin ku rêxistin bersiva hewcehîyên têkoşînanê bidin. Li ber vê rastîyê; em jî di wê bawerîyê da ne ku heke hewcehîya şoreşa Kurdistanê û prosesa yêkîtiya neteweyî pêdivîyê bi veguhorîn, nûvekirin û reformekirina KNKYê hebe, divêt bête kirin. Ji xwe KNK ji hewcehîya yêkîtiya neteweyî ya şoreşa Kurdistanê derketîye û pêkhatîye. Merheleya nû ya şoreşa Kurdistanê heke hewce dike ku reng û formekî nû bidine KNKYê, divêt bête kirin û em jî amade ne ku vî erkê xwe bînin cih. KNK di roja îro da, digel hejmareke kêr ya hêz û şexsîyetên serbixwe, bi giranî ji rêxistinên ku girêdayî sîstemê KCKyê ne, pêkhatîye. Stûna ragir ya KNKYê KCK ye û em di vê şûrê da ne. Vê gavê KCKyê pêşniyareke nû înyê rojevê û di mesaja we da jî gelek zelal û konkret ji KNKYê tete xwastin ku KNK û Kongreya Gel bibine yêk. Kombûna mezin ya KNKYê ev pêşniyara we bi dilgermî pêşwazî kir û ji bo karê pêdivî konseya rêvebir wezîfedar kir. Em jî bi berfirehî

li ser vê teklîfa we rawestan û me gelek maqûl, rasyonel û pozîtîv dît. Me biryar da ku vê pirsê digel KCKyê bi berfirehî gotûbêj bikin û bigihin encameke di xêra bizava neteweyî ya xelkê Kurd da. Em amade ne ku bi hev ra formûlekî wisa peyda bikin ku organîzasyonê xurtir û bi hêztir binin vucûdê. Bi avakirina du komîsyonan dibe anjî bi rêyeke di ya herî encamgir, em dikarin vê prosesa yêkkirina KNK û Kongreya Gel bi serkevtî bibin serî. Em di vê nameya xwe da modelekî konkret pêşniyar nakin û em dixwazin model û formûlê yêkkirinê di hevdiîtan da derkeve meydanê û li ser yêk ji wan bigihin encamê. Li vê derê xala giring ew e ku, em hazir in ku prosesa yêkkirinê bidin dest pê kirin.

Em li hêvîya bersiva we ne.

Di dawiyê da, dubare spasî hemû piştgirî, destek û hevkarîya we dikin û hêvî dikin ku hûn di hemû kar û xebatên xwe da serkevtî bin.

Digel xwezîyên herî baş û rêz û silavên me.

**Konseya Rêvebir ya KNKyê.**

31 Tebax 2007, Bruksel

\*\*\*

## Seradanîya heyetên KNKyê ji bo Kurdistana Federal didomin

Endamên Konseya Revebir ya KNKyê Adem Uzun, Nizamedîn Toğuç, Felemez Başboga û endamên KNKyê Medenî Ferho û Celal Kemalîzade ji meha Ilonê heta meha Çirîyê seradanîya partî, rêxistinên sivil û demokratîk, kesayetîyên polîtîk û nivîskar, ronakbîr û wezaret, wezîr, parlament û parlementeran kirin û pirsê bi giştî Kurdistanê digel wan gotûbêj kirin. Grûba KNKyê herweha di delîveyekê da çûne wargehên KCK û HPGyê jî û digel wan jî li ser rewşa bi giştî Kurdistanê û pirsê yêkitîya neteweyî û rola KNKyê dût û dirêj axivtin... Li ser vê gera grûba KNKyê, Felemez Başboga wisa got: "Me wek KNK, li ser rewşa dawî û destkevtên li Kurdistana Federal hem bi rayedarên Hukûmeta Kurdistanê ra, hem jî bi partî û rêxistinên li herêmê ra riberiz kir... Hatina me ya vê carê jî, li ser bingehekê ku em bikarin diyalogê xurt û dîplomasîyê di navbeyna Kurdan da bikin. Bûyerên ku li herêma Rojhilatanavîn diqewimin yêkser gelê Kurd jî eleqedar dikin. Bi taybetî Tirkîyê, Îran û Sûrîyeyê, bi awayekî pratîk û berbiçav li dijî Kurdan di nava tifaqan

da ne. Li hemberî vê yêkê em bi mebesta ku wekî Kurd, li hember van hewildanên tifaqên welatên herêmê derkevin, hatin... Bi kurtî armanca gera me ya li Başûra Kurdistanê ev e... Erkê KNKyê diyaloga di navbera sazîyên Kurd da ye... Pêşniyara jî bo avakirina komîteyê diyalogê ya di nava Kurdan da, ji aliyê hemû partîyên siyasî ve hate pejirandin. Em di vê hevîyê da ne ku di rojên pêş da ev yêk dê pêkbêt. Herweha wekî proje em dixwazin di demê pêş me da ji bo xala 140emîn bi endamên komîteya pêkanîna xala 140emîn da jî gotûbêjekê bikin û nêrînen xwe di vî derbareyî da binin ziman. Dîsa jî bo ku em bikarin di warê çandî, hunerî û civakî da xebatekê bikin, daxwaza me ew e ku, mîhrîcanekê çandî ya ku hunermendên çar perçayên Kurdistanê têda cih bigrin organîze bikin. Em dixwazin ku ev mîhrîcan bibe diyalogek di navbeyna hunermendan da..."

\*\*\*

## KNKyê bang li Kurdan kir ku yêkitîya xwe pêkbînin

Konseya Rêvebir ya KNKyê 16ê meha Çirîyê (meha deh) daxuyanîyêke çapemenîyê belav kir û bala xelkê Kurd û bîr û rehîya giştî ya cîhanê kêşa ser êrişkarîya dewleta Tirk ya li Kurdistanê. KNKyê destnîşan kir ku dewleta Tirk di hazirîya şerekî berfireh da ye ku ev şere dê timamî rojhilatanavîn bike gola xwûnê... KNKyê dubare aşkera kir ku pirsê Kurdî pirsêke polîtîk e û divê bi rê û metodên aşîyane û polîtîk bête çareser kirin. KNKyê got ku dewleta Tirk bi çu awayî xwe nêzîkî diyaloga digel berpirsiyarên bizava neteweyî ya xelkê Kurd nake û di metodên şer û leşkerî da israre dike. KNKyê bi zelalî got ku di israra şer da çare nîne û bang li dewlet û hêzên navneteweyî kir ku fişarê bibine ser dewleta Tirk ku dawiyê li operasyonên leşkerî bîne û digel berpirsiyarên xelkê Kurd rûne ser maseyê... KNKyê di daxuyanîya xwe da bihayekî mezin da reftara polîtîk ya PKK-HPGyê ku daîm terefdarîya rê û çareyên aşîyane dikin û wisa got: "Em bangî Kurdên hemû parçeyan dikin ku partî û rêxistinên sivil û demokratîk yê neteweyî, di serî da wekî dewleteke organîzator ya kolonyalîst Tirkîye û dijî hemû dewletên dagîrker yê Kurdistanê li ser stratejîyêke hevpar ya neteweyî tifaqa navxweyî pêkbînin..."

\*\*\*

# PJAKê hiştarek da Tirkîye û Îranê

Fermandarê hêza çekdar ya PJAKê Amed Malazgirt 16ê meha deh bi belavkirina daxuyanîyekê hiştareke xurt da Tirkîye û Iranê ku êrişên xwe yên li ser başûra Kurdistanê rawestînin. Amed Malazgirt di daxuyanîya xwe da wisa got: "Heke başûra Kurdistanê dagîr bikin eve dê li ser wan gelek giran raweste. Hêza me ya çekdar ne tinê hêza parastina rojhilata Kurdistanê ye, herwisa em dijî hemû êrişên li ser parçeyên di yên Kurdistanê jî hazir û amade ne. Heke Tirkîye û Iran êrişî Warên Parastinê yên Medyayê bikin em dê bersiveke gelek xurt bidine wan. Ji bo berxwedaneke bi vî rengî em bangî ciwanên Kurdistanê dikin ku tevî nav refên gerîlla bibin..."

\*\*\*

## Jin jîyan e, jîyanê nekuje!.

**Rêxistina Yêkitîya Neteweyan [UN]  
bi biryara xwe ya roja 17ê Kanûna  
1999ê, roja 25ê Teşrînê wekî rojeke  
navneteweyî "Bo şiddeta li ser jinê bes"  
îlan kir.**

**Komisyona jinan ya KNKyê bi  
munasebeta 25ê Teşrînê [Mijdar],  
ku roja dijî şiddeta li ser jinan e, ev  
daxuyanîya li jêr belav kir.**

**Li hemberî şiddetê bêdeng nemîne,  
tiştê bike!**

Axa Mezopotamyayê ku hem bûye serkanîya gelek dîterîyên bi armanca mirov û jîyana xwezayî û hem jî bûye landika pêşveçûna medenîyetê, îro mixabin ku ji ber zihnîyet û xebata desthilata mêrî bûye cografayêke xwûnawî. Di vê axa ku medenîyet lê şînbûyî da, li şûna bihayên pozîtîv yên wekî azadî, jîyana kolektîv, xweşbînî, aşî û demokratîfîyê, îro meyildarîyên negatîv yên wekî

tabû, keswerî û xweşnebînîyê û sistemên antî demokratîk û dîktatorîyal yên ku ji şerî xwûnê werdigirin bi cih bûne.

Ev berjêrbûna ku bi xiyaneta mêrî ya li ser jinê destpêkirî, êdî hatîye qonaxa hevdu qirkirina xelkên Rojhilatanavîn. Zihnîyeta desthilata mêrî, ku di binî da inkar û xiyaneta bihayên demokratîk heye, di her xelega jîyanê da xwe serdest kirîye û ev axe ji bo jina ku jîyan afrandîye kirîye goristan. Di vê axa ku mafê jîyanê têda pîroz bûye, di serî da jin û zarok û bo xelkên ku dixwazin bi serbilindî têda bijîn wisa tete gotin; "heke hûn berxwe bidin, dê bimirin, anjî bihayên xwe inkar bikin û teslîm bibin".

Rûbirû hatina xelkê Kurd, -ku yêk ji xelkên herî kevin yê Mezopotamyayê ye-, ya bi dîroka xwe û bihayên xwe yên civakî û bi zihnîyeta ku dixwaze hebûn û hêza jinê inkar bike û jinê bi qetlîaman bîne ser rê, ji alîyê têkoşîna xelkê Kurd ya li her çar parçeyan ve tete manaya qonaxêke giring. Belê îro di nav Kurda da herçend "Jin jîyan e" bête gotin jî, mixabin ku di jîyanê da mafê jîyana jinê nayê dayîn, ji ber zihnîyeta ku mêr xwe xwudanê hertîştî dibînin li seranserê Kurdistanê, beramberî jinê dawîya şiddet û kuştinê nayê û ev rewşe heroj xwûnê bi civatê dide berze kirin û ev kul dom dike.

Kuştinê ku li hemû parçeyên Kurdistanê tene kirin, encamên politîkên dewletên kolonyalist jî nîşan dide. Şerê li her çar parçeyan tete ajotin, dîrekt an îndîrekt hindek encaman jî bi xwe ra tine. Şerê ku tete manaya sazîbûna zihnîyeta desthilata mêrî, hem ji alîyê fizîkî, hem ekonomîk û hem jî ji alîyê psikolojîk ve tesîrê li ser jin û zarokan dike. Gelek jinên Kurd ji alîyê dewletên kolonyalist ve tûşî lêdan, îşkence û tecawîzê hatine, gundên wan hatine sotin û kavil kirin û paşê jî mecbûrî jîyaneke wisa hatine kirin ku ji alîyê kulturî, sosyal û ekonomîk ve ji wan dûr e.

Li milê dî, jin ji alîyê civatê ve bi gotina namûsê ve tete yêkkirin û di nav malê da jî bi zêdehî ve şiddeta fizîkî, cinsî û psikolojîk ya mêrî dibîne. Li cade û kolana jî li ber şiddeta tabû û edetên kevnare yên civatê jîyanê li jinê dikin cehnem. Jina Kurd herwisa di bin zulma bawerîyên dînî û mezhebî da jî dijî. Bi taybetî li başûra Kurdistanê hêj jî jin tete sunnet kirin, li rojhilata Kurdistanê jî recm wekî qanûneke dînî tete bi kar înan. Salê sedan jin ji ber vê jîyana ku tehemmul lê nayête kirin, xwe an disojin [dişewitînin] anjî dikujin. Sedan ji wan bi navê namûsê tene kuştin. Garantîya jîyana jinê li her çar parçeyên Kurdistanê jî nîne û ev rewşe di kesayetîya jinê da esasen drama ku civat dijî bi zelalî radêxe ber çavan.

Şiddeta ku bi rengên cuda li dinyayê tete dîtin, herçend li Kurdistanê kême zêde bête riberiz kirin jî, belê hêj jî gelek tiştên wekî têkilîyên enest, tecawîza nav malê, şûkirina [zewac] bi zorî, fuhûş û bi kar înana zarokên Kurd di çerxa pornografîyê da nayêne riberiz kirin û wekî tabû tene dîtin.

Digel hemû kêmasîyan jî, têkoşîna jina ya li çar parçeyan, di serederbûna pîrsgirêkên heyî da xebatên giring derêxistine meydanê û bûyne serkanîyên hevîyê.

Divêt neyête ji bîr kirin ku yêkitîya azad ya xelkê Kurd, bi hebûna jina Kurd ya azadbûyî mumkun e. Ji ber vê yêkê,

em dijî vê zihnîyeta di bin desthilata mêrî da, ku hemû bihayên xelkê Kurd inkar dike, ziman, kultur û hebûna wî nîne dike û herweha rêber Abdullah Ocalan heroj di bin şiddeta psîkolojîk da digire, bi hemû hêza xwe rawestî. Beramberî şiddeta li ser jina Kurd û tevayî xelkê Kurd têtê bi kar înan, em organîzebûna xwe xurttir bikin û bi îsrar li dij bisekinin. Ji bo jîyanêke pîroz ya bi aşî û serbilindî, em beramberî her reng şiddetê bêdeng nemînin û bikevin nav bizavê. Jin jîyan e, jîyanê nekuje!.

#### **Komisyona Jinan ya KNKYê**

25 Teşrîn [Mijdar] 2007

\*\*\*

### **Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKYê kombûna xwe li Instîtuya Kurdî ya Kölnê kir: Konferansa ziman tête kirin.**

Komisyonê 2ê meha Teşrînê [Mijdarê] li salona Instîtuya Kurdî ya Kölnê kombûna xwe kir û ev biryar standin:

1. Şertên avakirina Akademîya Zimanê Kurdî bêne gihandin.
2. Konferansa Ziman di roja “Cejna Zimanê Kurdî” da [14ê Gulana 2008ê] bête kom kirin.
3. Cejna Zimanê Kurdî [14ê Gulanê 2008] bête pîroz kirin.

2 Teşrîn [Mijdar] 2007, Köln

\*\*\*

### **Komisyona Karê Neteweyî ya KNKYê, 4ê Teşrînê [Mijdar] kombûna xwe kir û ev biryarên li jêr standin.**

1. Bi beşdarîya endamên komisyonê, digel ronakbîr û polîtîkerên Kurd, li ser rewşa bi giştî Kurdistanê di ROJ TVyê da program û panel bêne çêkirin.
2. Li serbajêrê Elmanyayê, Berlînê, li ser rewşa Kurdistanê konferanseke neteweyî bête amade kirin.

**Komisyona karê neteweyî ya KNKYê  
04 Teşrîn [Mijdar] 2007, Bruksel**

# **Daxuyanîya Konseya Rêvebir ya KNKYê**

#### **Konseya rêvebir ya KNKYê kombûna**

**xwe ya meha Teşrînê [Mijdar**

**– November] li Brukselê kir û ev  
daxuyanîya li jêr belav kir.**

#### **Bêyî piştgirtina neteweyî berjewendîyên neteweyî nayên parastin!**

Pirsa xelkê Kurd û doza Kurdistanê bi giştî îro rûniştîye nîveka rojeva cîhanê. Pêşhatinên gelek giring rûdidin li cografyaya ku Kurdistan lê. Hindî ku bizava neteweyî ya xelkê Kurd pêşdikeve, giranahîya xwe dide his kirin, êrişên li ser xelkê Kurd û bi giştî Kurdistanê jî têne zêde kirin. Serê vê êrişkarîya li ser Kurdistanê bi giştî dewleta Tirk dikêşe û tifaqdarên wan Îran û Sûrîye jî bi êrişên xwe yê piralî destekê didine hev. Yêk armanca wan heye ku hem di nav tixûbên xwe da bizava neteweyî ya xelkê Kurd bifetisînin, hem jî statuya Kurdistanê Federal têk bikin. Opreasyonên herî wêranker li bakur ji teref ertêşa Tirk ve têne kirin û di van demên dawîyê da bi dehan têkoşerên doza Kurdistanê hatine şehîd kirin. Ertêşa Tirk bi destûra hukûmeta Erdogan niha jî hazirîya êrişeke bi armanca dagîrîyê dike beramberî başûra Kurdistanê. Bi navê xelkê Kurd têkoşerên PKK-HPGyê berxwedaneke destanî nişan dan û halî hazir yêkîneyên ertêşa Tirk li ser “tixûbê bakur û başûr” hatine rawestandin. Di vê berxwedanê da ertêşa Tirk şkesteke mezin xwar û 8 leşkerên xwe dîl dane destê HPGyê. Li ser vê berxwedana xelke Kurd, ertêşa Tirk daku şkesta xwe perde bike, pêleke mezin ya şovenîzmê rakir li Tirkîyeyê û pêkve xelkê Kurd kire hedefa êrişên hêzên paramîlîter yê faşîst. Çi polîtîk bin, çi demokratîk bin li ser hemû rêxistinên Kurdan, li ser polîtîker û ronakbîrên Kurdan şiddeteke mezin û bêperwa têtê domandin ji alîyê hemû hêzên leşkerî û polîsî yê dewletê ve. Ertêşa Tirk hemleya nînekirina xelkê Kurd adeta daye dest pê kirin. Bakur û başûr hilgirtîye binê fişareke mezin ya operasyona leşkerî. Di serî da Amerîka, UN û gelek dewletên dî yê

mezin ketine nav hewildanan ku dewleta Tirk rawestînin. Di vê prosesê da reftara Yêkitîya Ewrûpayê mixabin ku derveyî normên demokratîk yên Ewrûpayê bûn û di çarçoveyê teng da jî be destek dane êrişkarîya dewleta Tirk ku em vê yêkê şaş dibînin û hêvî dikin ku Yêkitîya Ewrûpayê li normên xwe yên demokratîk û humanîter xwedî derkeve û piştevanîya nizava neteweyî ya xelkê Kurd bike û tesîra xwe li ser Tirkîyeyê bi kar bîne ku êrişkarîya xwe bi dawî bîne.

Dewleta Tirk vê gavê hemû dînamîkên xwe yên navîn û derve dijî xelkê Kurd aktîve kirine. Dijî vî cepheyê dewleta Tirk, pêkve xelkê Kurd û rêber û rêvebirên Kurd û Kurdistanê di enîya herî berfireh ya neteweyî da divêt bigihin hev û rê li ber êrişê ertêşa Tirk bigirin. Di enîgirîya neteweyî da nîşandana zeafa navxweyî dê hevgirtina Kurdistanî birîn bike û bivê nevwê dewleta Tirk dê ji vê rewşê istifade bike. KNK bangî hemû hêzên neteweyî dike ku fîretê nedine dewleta Tirk û nekevin nav manewrayên li ser berjewendîyên parçeyî. Li ber vê prensîbê KNK girtina buroyên PÇDKyê, li Kurdistanê Federal, ku partîyeye legal ya başûrî ye, şaş dibîne. Ev reftar xizmeta yêkitîya neteweyî nake û dijminên Kurdistanê dê ji van tarz polîtîkan istifade bikin. Herweha divêt piştevanîyeye xurt digel her reng têkoşîna xelkê Kurd bête kirin û beramberî meşrûîyeta têkoşîna çekdarî reftarên negatîf neyêne nîşandan, tam berkes desteka herî mezin ji bo hêzên parastina xelkê Kurd yên çekdar bête dan.

KNK bangî timamî xelkê Kurd dike ku hem li Kurdistanê, hem jî li meydanên diasporayê bi ruheke yêkgirtî ya neteweyî dengê xwe bilind bikin û pêkve êrişên dewletên dagîrker, Tirkîye, Îran û Sûrîyeyê şermîzar bikin. KNK herwisa hêvî û daxwaz dike ku xelkê Kurd li welat û her derê lê, seferber bibin û hem daxwaz û xwastekên xwe yên demokratîk bi dengê bilind bêjin, hem beramberî êrişan berxwe bidin, hem jî yêkitîya neteweyî di maksîmûm dereceyê da pêkbînin. Şkandin û belavkirina pêlên cepheyê antî Kurd û antî Kurdistanê, tek û tinê bi tifaqa xurt ya navxweyî dibe.

**Konseya Rêvebir ya KNKyê**  
**03 Teşrîn [Mijdar – November] 2007, Bruksel**

\*\*\*

## **Konferansa Jinên Kurdistanê tete organîze kirin**

Komisyona Jinan ya KNKyê biryar da ku di nav sala 2008ê da li Kurdistanê Federal "Konferansa Jinên Kurdistanê" pêkbîne.

**03 Teşrîn [Mijdar – November] 2007, Bruksel**

## **Dijî êrişê ertêşa Tirk banga tifaqa navxweyî**

Piştî ku "tezkereya operasyonê li ser başûra Kurdistanê" 17ê meha deh ji meclisa Tirk derket, ertêşa Tirk êrişên xwe yên li ser "tixûb" zêde kirin. Ertêşê bi desteka partîyên Tirk û hukûmetê bayekî dijwar rakir dijî Kurdan. Ewî li nav Tirkîyeyê bîr û rehîya navxweyî ya şoven gur kir û piştra jî digel çekên herî giran hejmara leşkerên xwe gihande çarêk milyonê û pêkve Kurd û herweha Kurdistanê Federal tehdît kirin. Dahola şer hate qutan û rêvebirîya Kurdistanê Federal li koşeyî hate şidandin. Ertêşa Tirk ji Sêwasê heta Hekarîyê operasyonên xwe di dereceya şiddeta herî xurt da domandin. Di nav vî bayê operasyonan da hazîrîyên dagîrîyeye li ser başûr jî hatin kirin û li Qendîlê hêzên HPGyê, li timamî başûr jî rêvebirîya polîtîk ya Kurdistanê Federal kirine nîveka nîşangeha xwe. Ertêşa Tirk bi biryara hukûmeta Erdogan û desteka partîyên şoven û nasyonalist yên Tirk adeta cepheyê herî fireh yê şer da dest pê kirin. Li ser van bûyeran KNKyê daxuyanîyek belav kir û ji hemû hêzên neteweyî xwast ku mil bi milê hev tifaqa navxweyî xurt bikin. KNKyê bang li hukûmeta Kurdistanê Federal jî kir ku ji ber gefên dewleta Tirk tifaqa navxweyî sist nekin û keysî nedine ertêşa Tirk ku baskê operasyonên xwe heta başûr fireh bikin. KNKyê herweha ji Amerîka û Yêkitîya Ewrûpayê jî xwast ku destekê nedin vê êrişkarîya dewleta Tirk û rê lê bigirin.

\*\*\*

## **KNKyê û Instîtuya Kurdî ya Kölnê bi hev ra kombûnek pêkînan**

Bi organîzatorîya KNKyê 26ê meha 11an di avahîyê Instîtuya Kurdî ya Kölnê da kombûneke fireh digel nivîskar, hunermend û ronkbîrên Kurd hate kirin û hem li ser êrişkarîya dewleta Tirk, hem jî tifaqa navxweyî ya Kurd hate sekinîn. Beşdarên kombûne bi yêkdengî bang li xelkê Kurd û rêxistinên polîtîk û sîvîl yên Kurdistanê kirin ku beramberî vê kuşt û kuştardarî û wêrankarîya dewleta Tirk reftareke xurt ya yêkgirtî nîşan bidin. Beşdaran herwisa bang li Amerîka û Yêkitîya Ewrûpayê jî kirin ku dawîyê li destekdayîna digel dewleta Tirk bînin û rê li ber vê êrişkarîya wan bigirin.

# Preskonferansa KNKyê li Parlementa Yêkitîya Ewrûpayê

*KNKyê 28ê meha 11an [Teşrîn – Mijdar – November] di avahîyê parlamenta Yêkitîya Ewrûpayê da "preskonferans"ek amade kir. Nêzikî 50 ronakbîr û rojnamevanên Kurd û bîyanî beşdarî vê kombûna çapemenîyêbûn. Preskonferansbihevkarîyaparlementerên grûbên keks û komûnîstan hate organîze kirin. Enstîtuya Kurdî ya Brukselê jî destek da preskonferansê. Daxuyanîya KNKyê serokê KNKyê Ali Yigit bi Kurdî, endamê KNKyê Ehmed Dere jî bi Fransî pêşkêş kirin. Daxuyanîya KNKyê li jêr e:*

## **Endamên birêz yê çapemenîyê, Dostên hêja;**

Li ser banga Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê – KNKyê; bi şexsiyet û dostên ku piştgirîyê didin gelê me, di bin banê Parlemeta Ewrûpayê da, ku ev wek dilê Ewrûpayê tête dîtin, em dixwazin derbareyê pêşkevînin li Kurdistanê da we agahdar bikin û bi alîkarîya we dengê xwe bigihînin cîhanê.

Wekî hûn jî dizanin, li Tirkîyeyê ji 20 milyona zêdetir Kurd dijîn. Ziman, çand, nasname û hebûna wan ya neteweyî qedexe ye. Daxwazeke biçûk di vê derbareyê da, rastî şiddetên mezin têt. Berxwedana li hember vê yêkê, ji 23 salan zêdetir e dom dike. Ji bo çareserîya pirsgirêkê, aliyê Kurd, heta niha 5 car e ku yêkalî agirbest îlan dike. Dewleta Tirk êrîşên xwe didomîne û dixwaze pirsgirêkê bi rêya şiddetê çareser bike.

Di van demên dawî da, bi sebebê operasyonên bênavbir yê ertêşa Tirk, şerên dijwar rûdidin. Di serî da DTP, êrîşên li ser sazîyên demokratîk zêdebûne, mal û kargehên Kurdên li metropolên Tirkîyeyê bûne hedef û li dijî Kurdan kampanyayêke lînkîrîne dane destpêkirin. Ertêşa Tirk, vê gavê jî li ser tixûbê başûra Kurdistanê [Bakura Iraqê] bi sed hezaran leşker komkirîye û tehdîta dagirkirina Başûr dike.

Li aliyê dî, Rêberê KCKyê Abdullah Ocalan bi tena serê xwe ev 9 sal in ku li Girtîgeha Îmraliyê dimîne, tecrît û êrîşên li ser, wekî îşkenceya psikolojîk zêde bûne. Bi van jî dilê wan rehet nebû, bi jahrdayîna hêdî hêdî qestî

jîyana wî kirin. Li ser reaksiyonên neteweyî ya gelê Kurd, CPT heyeteke lêkolînê şand Îmraliyê. Lê di ser ra 6 meh derbasbûn hêj jî bo bîr rehîya neteweyî û navneteweyî encam nehatîye aşkera kirin.

Tirkîye li cihê ku pirsgirêka Kurd çareser bike, ji aliyêkî ve operasyonên îmhayî didomîne, ji aliyê dî ve jî tifaqên dijî Kurdan pêş dixê. Tifaqa antî Kurd ku bi salan e bi Îran û Sûriyê ra dide meşandin, bi beşdariya dewletên herêmê yê Erebên paşverû, tifaq berfireh kirin. Vê gavê bi destek, tehdît û şantajên Amerîka, hêzên Başûr kirine nav rewşeke xirab. Di nav hewildaneke wisa da ne ku dixwazin bi giştî desteka Yekîtiya Ewrûpayê [YE] jî bistînin.

Divêt ev yêk bête zanîn; Tirkîye gav bi gav ber bi şerekî herêmî ve diçe û xuya dike ku YE jî ji vê yêkê ra çavên xwe digire. Anku bi mesaja; `` Mafê Tirkîyeyê heye ku ji bo parastina xwe operasyoneke bitixûb bike`` , lambeya kesk vêdixê. Başê, ``ji bo xwe parastinê mafê Tirkîyeyê heye`` ku êrîşê bibe ser 20 milyon Kurdên ku dibêje nînin, ma gelo yê li hember van êrîşan mexdûr û mezlûm dibe, anku mafê xwe parastina gelê Kurd jî nîne? Ev helwesta YEyê xizmeta lihevhatina Kurdan û dewleta Tirk nake. Hewce ye herkes baş bizane ku, operasyoneke li dijî başûra Kurdistanê, bitixûb be jî, pirsgirêkê kûr dike û Rojhilatanavîn ber bi kaoseke nû ve dibe. Ev jî tête manaya dîsa şerekî bi mirin û bi xwûn. Şerekî wiha giran ku dixwazin ji Kurdistanê bidin destpêkirin, dê rojavayê jî bigire nava xwe. Lê mixabin li hember vê tehlîkeyê çu sekaneke cidî nîne. Ev rewş mirovan dixê nav endîşeyan!

Divêt Tirkîye û ertêşa xwe vê yêkê baş bibînin; eger hêza demokratîk û siyasetî ya gelê Kurd, ku bi bedelên mezin hatîye afirandin, nebînin û dîsa di şiddeta heta îro da îsrar bikin, pirsgirêka Kurd çareser nabe. Daxwaza; ``an teslîmîyet, anjî îmha`` ji gelê me ra êş, ji herêmê ra jî bêstîqrarîyê tîne. Dîtin û nîşandana pirsgirêkê wekî asayîş û ewlekarîyê, ji xapandinê zêde tiştek nîne. Tirkîye, ancax bi projeyêke demokratîk dikare pirsgirêkê çareser bike û bikeve prosesê aştiyê. Em Dewleta Tirkîyeyê dawetî rêya aqilane dikin ku ji vê rêya bê encam vegere!

Di vê çarçoveyê da, dîsa ji bin banê YEyê; di serî da cografyaya demokratîk ya Ewrûpa, em bang li hemû aliyên têkildar dikin ku cidîyeta rewşê bibînin û ji bo ku trajedîyêke nû dernekeve meydanê, li hember êrîşkarîya Dewleta Tirk, bi xurtî rawestin!

Em li vê derê bang li hukûmeta Kurdistanê Federal û birayên xwe yê başûrî jî dikin; êrîşa Tirkîyeyê li hember hemû Kurdan e. Dibê ku di destpêkê da hedef gerîla bin, lê hedefa duyemîn qazanc û destkevîyên we ne. Ji ber vê yêkê, em hewildanên dawîyê yê hukûmeta Kurdistanê û dorpeçkirina binke û mangêhên hêzên gerîla, ji aliyê berjewendiyên neteweyî ve bi tehlîke dibînin. Hewce ye demek zûtir ev reftara negatîv bête terk kirin û şûna wê li ser esasê berjewendiyên neteweyî û li hemberî neheqîya Dewleta Tirk pozisyoneke hevgerî ya neteweyî bête



nîşandan. Divêt hemû Kurd wisa bikin!

Li hemberî înkâr û sîyasetên îmhayî yê Dewleta Tirk ya bêçareserîyê û ji tecrît û îzolasyona li ser Rêberê KCKyê Abdullah Ocalan, wekî alîyê Kurd em hemû dibêjin; ‘Êdî Bes e’! Li welat û li derveyî welat, em dê li her derê, li dijî van êrîşan rawestin, azadî û rûmeta xwe biparêzin. Em bi bawerî ne ku hemû gelê me jî bi her awayî tevî van daxwazên me dibin.

Mirov dikare wekî encam bibêje ku israra Dewleta Tirk ya di bêçareserîyê da, bêistiqarîya navçeyê ye û zêdetir herikîna xwûnê ye. Li dijî vê yêkê daxwaza çareserîya demokratîk ya gelê Kurd, îstiqrara navçeyê û hevgerîna li ser bihayên hevdem e. Alîyê Kurd; li cihê bêçareserîyê; çareserîyê, li cihê cudahiye; jîyaneke dilsoz û bi hev ra, li dijî şer; dîyalog û aşîyê, li hemberî dijminîyê; dostîniyê tercîh dike.

Ji kesên li vê derê amade û kesên ku desteka xwe dan û ne li vê derê ne, em silav û rêzên xwe pêşkêş dikin.

**Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê**  
Parlementa YEyê, Bruksel  
28 Mijdar [Teşrîn – November] 2007

\*\*\*

***“... Divêt Tirkîye û ertêşa xwe  
vê yêkê baş bibînin; eger hêza  
demokratîk û sîyasî ya gelê Kurd, ku  
bi bedelên mezin hatîye afirandin,  
nebînin û dîsa di şiddeta heta îro da  
israr bikin, pîrsgirêka Kurd çareser  
nabe. Daxwaza; “an teslîmîyet, anjî  
îmha” ji gelê me ra êş, ji herême  
ra jî bêistiqarîyê tîne. Dîtin û  
nîşandana pîrsgirêkê wekî asayîş û  
ewlekarîyê, ji xapandinê zêde tiştêk  
nîne. Tirkîye, ancax bi projeyêke  
demokratîk dikare pîrsgirêkê çareser  
bike û bikeve prosesê aşîyê.  
Em Dewleta Tirkîyeyê dawetî rêya  
aqilane dikin ku ji vê rêya bê encam  
vegere!..”***

# Rêberê KCKyê

## Abdullah Ocalan:

**“Ez ji bo Kurdan Otonomîya  
Demokratîk ya Kurdistanê  
pêşniyar dikim.”**

“... Ez iddia dikim, projeya me ya çareserîyê ne zerarê dide tixûban ne jî yêkpareyîya dewletê. Dîsa ve dibêjim, ev proje ne dewletê ne jî miletî parçe nake. Ez vê yêkê jî ve derê bi vekirî dibêjim. Heke dibêjin bila xwûn nerije, ez hazirim ku bêyî ku dilopek xwûn birije çareser bikim. Min berî nihe jî got, heke îradeya hewce bête nîşandan, çî bikeve ser min ez dê bikim. Heke dîyalog bête danan, hingê prosesa agirbesa domdirêjê dê destpêbike. Heke hukûmet, bi taybetî serokwezîr ji dil dibêje bila xwûn nerije, divêt wisa bête kirin. Bi ya min jî mirina ciwanên 20 salî mixabin e û paşê milê ekonomîk jî heye. Ma dewleteke dî ya ku ekonomîya wê hinde krîtîk û bi krîz heye? Deynê derve hatîye bi milyaran dolarî. Ji bo vî xelkî jî guneh e, vê yêkê heq nakin belê îradeya çareserîyê nîne. Ez dibêjim ku em vê îradeyê nîşan bidin, çî bikeve ser me em dê bikin. Piştî vê gavê ji bûn û bûyeran AKP berpirsiyar e, heke xwûn birije em ne berpirsiyar in, ku me jî gelek kuştî dan û jana me jî heye... Ez ji bo Kurdan Otonomîya Demokratîk ya Kurdistanê pêşniyar dikim. Gotina Kurdistanê ji xwe termekî cografî ye û Kurdan jî negotîye, eve di demê Sultanê Selçûkîyan Sultan Sencer da hatîye gotin. Bi kar îna gotina Kurdistan çu zerar têda nîne... Eve hem dê dijî paşvemanên navîn, feodalî û yê dî, demokratîzebûna navxweyî pêkbîne, hem jî dê ji bo derve hebûna Kurdan nîşan bide. Di vê organîzebûnê da dijîbûna dewletê nîne, armanca danana dewletê jî nîne. Modelek e ku di nav tixûbên heyî û hebûna dewletê da dê temsîla azadîya Kurdan bike... Di otonomîya demokratîk da Kurd bi rengêkê dê azadîya xwe bi dest ve bînin. Perwerde, ziman, ji bo hewcehiyên dî yê kulturî dikarin dibistanên xwe vekin. Xelkê pîrsgirêkên ekonomîk hene, heke hewce be dikarin banqe û kooperatîvên xwe danin. Ji bo perweredyê ziman û hewcehiyên dî dikarin enstîtuyên xwe pêkbînin. Eve nayête manaya nebûna dewletê anjî redda dewletê. Li rex dezgehên dewletê, avabûneke ku Kurd xwastekên xwe pê bînin cih. Hindek maf komî ne û tenê bi serê xwe manayekê nadin... Kurdan jî dê bi çekên sivik hêza xwe hebe. Li gund û bajêrkan wekî milîsên xelkî. Lê divêt bi ceşîtiyê [koruculuk] neyête têkilav kirin, çiku ew ji bo berjewendîyên xwe yê kesî, ji bo pareyî çekê werdigirin. Piçek mîna pêşmergeyan, lê ew jî wekî ertêşa nizamî ne ku qesta min ne ew e. Ez ji hêzeke wisa behs dikim ku girêdayî xelkê bin û pîrsgirêkên xelkî di berjewendîyên xelkî da çareser bikin. Dikarin wekî niv jandarm bin û dewlet jî vê yêkê qebûl bike û bi

qanûnê bête danan. Li bajêran wekî polîsê beledîyeyan dikarin bibin hêzên asayîş û trafikê. Numûneyên bi vî rengî li dinyayê gelek in... Divêt ji bo Kurdan Diyarbekir merkez be çiku Kurd li wê derê dijîn... Her xelkekî ku pirsgirêkên bi vî rengî hebin bila serî li organîzebûneke wisa bidin... Merkezîyetîya hişk li meydana ye... Di bingehê pirsgirêkên Tirkîyeyê yên ekonomîk û dorberî da ev merkezîyetîya hişk heye... Hal ew e ku navçe bila bi organîzebûna xwe pirsgirêkên xwe çareser bikin. Eve tinê ne pirsê Kurdan e, heke Tirk û Çerkez jî dibêjin ku wan jî pirsgirêkên azadîyê hene bila ew jî kongreyên xwe yên civatî damezrînin...»

**Abdullah Ocalan**

[Ji hevdîtina digel awûkatan ya 28.11.2007ê]

\*\*\*

## **Ocalan : «Kerkûk divêt di nav Federasyona Kurdistanê da be.»**

Piştî êrişa hewayî ya dewleta Tirk awûkatên Ocalan 26ê Kanûnê bi Ocalan ra hevdîtin kirin. Di wê hevdîtînê da Ocalan daxuyanîyên balkêş dan. Birek ji wê daxuyanîyê didin :

**Tirkîyeya bi du merkezan**

«... Ev operasyone telî [kemîn] ye, ma Tirkîye vê nabîne? Reftara Amerîka û Yêkitîya Ewrûpayê [YE] ne çareserî ye. Çareserî ne li Amerîkayê ye, li nik me ye. Em tinê bi riberîza çareserîyên xwe dikarin bigihin derekê. Li Tirkîyeyê dewletek hate damezrandin belê xelkê Tirk fêrî heyîna dewletê ye. Hindî xelkê Kurd e, ji berê were li şûna ku bibe xwudanê dewletekê, zêdetir meylê azadî û demokrasîyê ye. Reftara Kurdan ya demokratîzekirinê heke karî ku dewletê demokratîze bike hingê Komara Tirkîyeyê dê bête ser xeta me ya Komara Demokratîk ku eve damezrîna Komara Demokratîk e. Eve yêk dewlet û yêk demokrasî ye!. Heke eve neyête qebûl kirin anjî pêkneyêt, Kurd dê demokrasîya xwe li ser bingehê merkeza Diyarbekirê ava bikin. Otonomîya Azad û Demokratîk ya Kurdistanê!. Li vê derê ez behsê dewletekê nakim. Yêk dewlet du demokrasî; merkeza ya dî Stanbol dibe an Izmir nizanîm belê merkeza yêkê dê

Diyarbekir be, anku du demokrasî û yêk dewlet. Ez bêjim Kongreya Civata Demokratîk ya Diyarbekirê dixebite. Bi hizira min dewlet ne çareserî ye. Rewşa Israîl û Filistinê li meydana ye. Dixwazin du dewletan ji hev cuda ava bikin. Di pirsê Qibrîsê da jî, di yêk welatî da formûlê du dewletî hate dîtin ku nabe. Yêk dewlet yêk demokrasî anjî du demokrasî yêk dewlet, belê tercîha me yêk dewlet yêk demokrasî ye... »

**Ez parêznameyeke nû hazir dikim**

«... Ez bêjim mafê min yê pêşkêşkirina parêznameyê heye. Min dest bi parêznameyê kir û bira yêkemîn xilas kir. Nihe bira duyê dinivîsim. Dihizirim ku parêznameya xwe bikime pênc bir : Bira yêkemîn : Sivîlîzasyon [Medenîyet]. Bira duyemîn : Demokrasî. Bira sêyemîn : Sosyolojîya Azadîyê. Bira çaremîn : Rojhilatanavîn. Bira pêncemîn : Kurd. Min di parêznameya xwe da jî şertên ez têda jî behs kir. Ez dizanim ku tabloyeke bêhêvî û pesîmîst [reşbîn] heye, belê ez diya ve bihêvî me, dihizirim ku li ser bingehê azadîyê dê pêşhatinên baş bêne dîtin, min hêvîya xwe berze nekirîye. Berî çend roja doktorekî bîspor hat, cîhazek înbûn û ji bo teşxîsê hindê tehlîl kirin. Dilopeke di nav poşetan da dane min û eve piçekê bêhna min vedike, piçekê rehet bûm lê ji ber vê yêkê rondik ji çavên min dibarin. Min berê jî behsê Kerkûkê kiribû. Divêt cihê ji bo Tirkmen û Asûrîyan jî bête dan. Rengekî otonomîyê ji bo Kerkûkê jî dibe, lê belê **Kerkûk divêt di nav Federasyona Kurdistanê da be...** »

[Ji hevdîtina Ocalan ya 26ê Kanûna 2007ê]

\*\*\*

## **Ji KCKyê deklerasyona çareserîya demokratîk**

Konseya rêvebir ya KCKyê û serokatîya dîwana Kongreya Gel, 30ê meha 11an, bi hev ra deklerasyonêk belav kirin û banga çareserîya demokratîk dane bîr û rehîya navxweyî û ya derve. Jêdereke kurt li jêr e :

Yêk ji pirsgirêkên herî bingehîn û qedîm yên rojhilatanavîn pirsê Kurdistanê ye. Binasên polîtîk, neteweyî û civakî yên vê pirsê hene, belê ev pirsê ji teref hêzên ku bi vê pirsê ve girêdayî ve bi rastî û bi micidahi li ser pirsê nayê rawestan. Li goreyê giranahiya xwe ya bi aşî, istîqrar û ewlekarîya navçeyê ve girêdayî bi xwudanên pirsê ve

nayête riberiz kirin.

Sê meha 11an ya sala 2007an, li Waşingtonê di hevdîtina serokê Amerîkayê Bush û serokwezîrê Komara Tirkîyeyê [KT-TC] R. T. Erdogan da temsîlkara bizava azadîyê ya xelkê me belasebeb wekî dijmin hatîye îlan kirin, tesfîyeya wê hatîye xwastin, belê li ser çareserîya pîrsa Kurdî, ku şertê hebûna PKKyê ye, daxuyanîyek nehatîye dan. Hindî Yeyê ye, wê jî ji bo operasyona ertêşê lambeya kesk vexistîye û bi vê reftara xwe cesaret hatîye dan ku qetlîamên nû li ser Kurdan bêne kirin... Di nav van şertan da, di serî da terefê Tirk û aliyên di yên cuda, agirbeseke yêk alî ji me dixwazin...

Gelek aşkera, pîrsa Kurdî hatîye qonaxeke hessas û krîtîk. Em wekî bizava azadîyê, di vê qonaxa giring û nazik da, bi pêşkêşkirina projeya xwe ya çareserîyê erkê xwe dizanin ku rê li ber hêzên ku ji bo çareserîyê banga dikin, xweş bikin.

Tête zanîn ku rêberî û bizava me, ev 15 sal in ku ji bo çareserîyê aşfîyane ya pîrsa Kurdî di nav hewildanan da ne. Ji 1993ê were bizava me pênc caran agirbesa yekalî îlan kirîye û ji bo ku prosesa aşfîyane û demokratîk pêşbikeve xebateke xurt kirîye. Belê di her carî da dewleta Tirk bi operasyonên birandêr bersiv daye.

Wekî bir û rehîya giştî jî baş dizane, berî salekê di serî da Amerika û Yekîtiya Ewrûpayê û hindek hêzên navneteweyî û hindek dezgehên dewleta Tirk, herweha DTP û hindek derûdorên sivil û demokratîk û nivîskar û ronakbîrî yên Tirkîyeyê, dewleta Iraqê û nimayendeyên hukûmeta Kurdistanê Federal xwastin ku bizava me agirbesê îlan bike. Digel banga rêberîya me, bizava me jî 1<sup>e</sup> Çirîya 2006ê pêve agirbeseke bêtixûb îlan kir... Di vî demî da serfermandariya ertêşa Tirk aşkera kir ku ew dê heta yêk gerilla nemîne operasyonên xwe bidomînin... Piştî ku dewleta Tirk ji êrişên li ser dînamîkên azadîyê yên xelkê Kurd yên li Tirkîyê û bakura Kurdistanê encam wernegirt, vê carê jî bi slogana « kana pîrsê li derve ye » operasyona li ser başûra Kurdistanê kirîye serê rojê ya xwe... Bi vê armancê « tezkeriya şer » ji meclisa xwe derêxist ku ew dê bibe zemîne şer û bêistiqrarîyê nû li rojhilatanavîn... Dewleta Tirk digel van hemû êriş û plangîrîyên xwe, xwe wekî terefekî ku bi ber erîşan dikeve nîşan dide û edebîyata mexdûriyetê dike... Hal ew e ku rewş tam bereksî gotina wan e. Yên ku di bin erîşan da ne, xelkê Kurd û nimayendeyên qanûnî û meşrû yên xelkê Kurd in. Hejmar û çapa operasyona û axivtinên generalan vê yekê bi vekirî nîşan didin. Gerilla ne di erîşê da ye, di pozisyona parastina meşrû da ye. Yê ku di pozisyona erîşê da ye ertêşa Tirk e û kuştîyên ku dide jî ji ber vê erîşkariya wê tene dîtin... Yên ku di 2006ê da banga agirbesê bo bizava me kirî, piştî van erîşên berfireh bêdeng mane û ji bo pêşkevîna prosesa aşfîyane di nav hewildaneke micid da nebûne û sozên xwe neînane cih... Nihe eynî hêz dîsa ve ji me dixwazin ku em agirbesê îlan bikin... Agirbesa jî 1<sup>e</sup> Çirîya 2006ê were hatîye îlan kirin, ji teref me ve nehatîye rakirin, lê ji ber erîşên ertêşa Tirk û dewletê şertên agirbesê nemane... Di vê rewşê da, hêzên ku dixwazin pîrsa Kurdî aşfîyane çareser bibe û banga agirbesê li me kirine, divêt ji dewleta Tirk bixwazin ku

bi agirbesa me îlankirî ve lêbin ku ewe xelesa sereke ya çareserîyê ye. Çiku rewşa ku tete xwastin bi lêbûna ertêşa Tirk dê pêkbêt. Piştî vê, li ser bingehe projeyêke politîk prosesa ku sileh ji dewreyê derdikeve dikare pêş bikeve. Li goreyî me ev projeya politîk, ku berê DTPyê jî piçek beyan kiribû, çarçoveya otonomîya demokratîk, di cih da ye ku esas bête wergirtin. Çareserîya di nav Komara Tirkîyeya Demokratîk da, bi rengê Otonomîya Demokratîk ya Kurdistanê, dê zemîne yekitiya bidil biafirîne... Kilîlê çareserîyê di çarçoveya van heft maddeyan da dibe.

1. Naskirina huviyeta Kurd û di bin banê huviyeta Tirkîyeyîyê û di nav makqanûnê da garantîkirina hemû huviyetan,
2. Hemû astengên li pêşîya ziman û kultura Kurdî bêne rakirin, mafê perwerdeya makzimanî bête qebûl kirin û li navçeya Kurdistanê li tenîsta Tirkî, Kurdî jî wekî zimanê duyê yê fermî bête qebûl kirin, digel vê rêz li mafên kulturî yên kêmanîyên di bête girtin,
3. Li ser bingehe azadîya bawerî, raman û xwe îfadekirinê, mafê politîk û rêxistinî bête nas kirin, di makqanûn û qanûnan da, di serî da diskrimînasyona cinsî û hemû newekhevîyên civakî bêne rakirin.
4. Bi projeyêke lihevhatina civakî, bi armanca ku du civat hevdu aza [efû] bikin û aşfî û azadîyê ava bikin, di serî da rêvebirîya PKKyê û hemû girtîyên politîk bêne berdan û rê li ber têkilbûna wan ya jîyana sosyal asteng neyên danan,
5. Hêzên ku ji bo şerê taybetî li Kurdistanê hatine bi cih kirin, paşve bêne birin û sistemê ceşfîyê [Korucutîya Gundî] bête belav kirin û ji bo ku gundîyên ku ji erdê xwe hatine bar kirin veqerine erdê xwe projeyên sosyal û ekonomîk bêne çêkirin,
6. Bi amadekirina qanûneke nû ya rêvebirîya navçeyî, desthilata rêvebirîya navçeyî bête xurt kirin,
7. Paralelî bi cih înana van xwastekên li jor hatine gotin, bi qebûlîya herdu terefan prosesa çek danana gerilla ya bi qonaxî bête dest pê kirin ku bi vî rengî têkilî jîyana qanûnî, demokratîk û sosyal bin.

Em wekî bizav, daku çareserîya demokratîk û aşfîyane pêşbikeve, bi vê deklerasyonê ve em bi fermî îlan dikin ku em ji bo çareserîyê hazir û amade ne. Em bangî hemû hêzên bi pîrsê ve mijûl û têkildar dikin ku ji bo çareserîya demokratîk û aşfîyane ya pîrsa Kurdî erk û berpirsiyarîyên xwe bînin cih û lê xwudan derkevin.

**Konseya Rêvebir ya KCKyê û Serokatîya Dîwana Kongreya Gel**

**30 Teşrîn [Mijdar - November] 2007**

\*\*\*

# Di Parlementa YEyê da Konferansa li ser Kurdan

Di navbeyna 3-4ê Kanûnê da li parlementa yêkitiya Ewrûpayê "4. Konferansa YE, Tirkîye û Kurd" pêkhat. Komisyona hevweletîyan ya Yêkitiya Ewrûpayê ev konferans organîze kir.

Konferans di bin sihwanya piştgiriyê ya van navdarên cihanê da kombû:

Desmond Tutu, Matran [Ji Afrîkaya Başûr û xelatgirê Nobelê, -aşî]

Dr. Şîrîn Abadî [Ji Îranê û xelatgira Nobelê, -aşî]

Harold Pinter, Nivîskar [Ji Brîtanya, xelatgirê Nobelê, -edebiyat]

Prof. Dr. Noam Chomsky [Ji Amerîka Yêkbûyî]

Yaşar Kemal, Nivîskar [Ji Tirkîyeyê]

Bianca Jager, Ambasador [Ji Nîkaraguayê, Qazida niyeta baş ya Yêkitiya Ewrûpayê]

Leyla Zana, Polîtîker [Ji Kurdistanê]

Konferans bi beşdariya gelek polîtîker, akademîker, nivîskar û ronakbîrên Kurd, Tirk û bîyanîyan ve kombû û danezana encamê belav kir. Di vê danezana 30 maddeyî da ev xalên li jêr hatin destnîşan kirin;

- Pîrsa Kurdî bi rêya diyalogê û awayên aştiyane bête çareser kirin.
- Operasyonên leşkerî bêne rawestan.
- Ji dewleta Tirk û PKK-HPGyê daxwaza agirbesê hate kirin.
- Girtîxaneyên Imraliyê bête girtin.
- Şertên ku Abdullâh Ocalan têda bêne qenc kirin.
- Tepeseriya li ser DTPyê bête sekinandin.
- Astengên qanûnî yên li pêşiya aşkerakirina bir û ramana azad bêne rakirin.
- Girtiyên polîtîk bêne serbest kirin.
- Mafên Kurdan di makqanûnê da bêne garantî kirin.
- Piştewaniya endametiya Tirkîyeyê ji bo Yêkitiya Ewrûpayê têde destek kirin.
- Yêkitiya Ewrûpayê di çareseriya pîrsa Kurdî da roleke çêker bileyize.

Zerar û tehrîbata çêkirina baraja hesenkeyfê jî hate destnîşan kirin û hate xwastin ku ev projeye bête sekinandin.

Di vê konferansê da serokê KNKyê Elî Yigit jî axivtinek kir. Li jêr wergêra jêdereke kurt ya axivtina wî didin.

## Mêhvan û beşdarên hêja, [\*]

Rojhilatanavîn û welatê me Kurdistan ji demekî giring derbaz dibin. Baş tête zanîn ku yêk ji pîrsên bingehîn yên navçeyê pîrsa Kurdî ye. Zulm û zora dewletên ku ev pîrsa Kurdî heyî, antî demokratîzma li navçeyê xurttir dike û neçareseriyê kurtir dike. Berpîrsiyarên ve giriftariyê hêzên navneteweyî û yên navçeyê ne. Xelkê Kurd ji vê neçareseriyê gelek êş dîtiye, belê dewletên li ser Kurdistanê serdest jî negihîştine tenahiye. Heta ku rojhilatanavîn demokratîze nebe, şik û dijberiya di navbeyna xelkên Kurd, Tirk, Erebi, Faris, Cihû û Asûriyan da xilas nabe. Hal ew e ku rojhilatanavîna ku gihîştîye aşî, tenahî û stabîlîteyê, dê ji bo aşî, tenahî û stabîlîyeta cihanê jî bibe garantîyek...

Hêviya me ji YEyê ew e ku pîrsê bi hemû zelaliya xwe ve bibîne û ji bo çareseriyê reftareke zelal û objektîv nîşan bide. Mixabin ku me ev pozîsyon di rapora dawîyê ya Komisyona YEyê da ne dît...

Xelkê Kurd heta nihe ji bo çareseriya demokratîk hewildanên çêker nîşandane û fedakarî kirîye. Bi vê armancê gelek daxuyanî dane û projeyên aştiyê pêşkêş kirine. Lê belê, ji terefê dewleta Tirk ve çu bersivên pozîtîv newergirtine, tam bereks ev slogana fermî "yêk dewlet, yêk ala, yêk netewe, yêk ziman" bihîstine û zihniyeta xwe ya "Xwezîya ku yêk bêje ez Tirk im" dubare kirine. Operasyonên xwe yên kujer domandine û hêj jî didomînin. Dewleta Tirk li hemberî aştiwxwaziya terefê Kurd "An teslîmiyet, an îmha"yê dide pêş ku ev polîtîke dê ji bo xelkên me û navçeyê bêistiqrariyê bîne...

Pîrsa Kurdî di roja îro da êdî tixûb bezandîye û hatîye dereceya navneteweyî... Di serî da Amerîka û YE divêt roleke çêker bileyizin... Tirkîye jî divêt êdî ve pîrsa navxweyî bibîne û rêya çareseriyê jî digel Kurdên li nav tixûbên xwe bibîne... Di cihana îro da kîjan îradeya demokratîk û norm dikare qebûl bike ku xelkek bêyî huyiyet û şexsiyet bijî? Xelkê Kurd dixwaze zimanê xwe, kultura xwe, huyiyeta xwe bijî û bide jîyandin. Terorîzm, cudaxwazî, parçekirina Tirkîyeyê di kîdera ve daxwazê da ye. Eve demagojî ye... Terefê Kurd dixwaze di çarçoveya biratiya Kurd, Tirk, Fars, Erebi, Cihû û hemû xelkên navçeyê û di nav sîstemekî demokratîk û dadyar da hemû pîrsgirêk bi rêya diyalogê û awayên aştiyane bêne çareser kirin... Hem Amerîkayê, hem jî dewletên navçeyê projeyên li goreyî xwe hene. Li tenîştan van herdu hêzan, proje û modelên xelkê Kurd jî hene. Ji federasyonê heta otonomîya demokratîk, konfederasyona demokratîk û serxwebûnê alternatîv hene... Di serî da Tirkîye, hemû dewletên navçeyê divêt digel Kurdên di nav tixûbên xwe da aşî bin û xwasteka Kurdan ya otonomîya demokratîk qebûl bikin... Heke alternatîva otonomîya demokratîk jî neyê qebûl kirin û polîtîka îmhayê bête domandin, hingê jî rêya serxwebûnê pêve çu rê li ber Kurdan namîne... Çiku tiştêkî dî ye ku Kurd bikin namîne. Di rewşeke wisa da dê şerekî ku sed sala bajo derkeve di navbeyna Kurda û Tirkan da. Hingê jî Kurd mecbûr in ku tedbîrên xwe bistînin û xwe biparêzin...

Di encam da, israra dewleta Tirk ya di şiddetê da

bêistiqrarîya navçeyê ye û zêdetir xwûn e. Belê xwasteka terefê Kurd ya otonomîya demokratîk istiqrara navçeyê ye û gihiştina bihayên hevdem e. Terefê Kurd şûna arêşeyê çareserîyê, şûna cûdabûnê yêkitîya bidil, şûna teşqeleyê dîyalogê, şûna şer aşîyê, şûna dijminahîyê dostayetîyê tercîh dike.

**Alî Yigit**  
**Serokê KNKYê**

[\*]  
Wergêra ji Tirkî: Rojan Hazim

\*\*\*

## **Ehmed Turk li konferansa li avahîyê parlamenta YEyê axivt:**

“... Partîya me di xwasteka xwe ya çareserîya demokratîk da bi îrade û bi biryar e. Di vê oxirê da em dikarin jîyana xwe gorî bikin, bi ber zulma mejîyê inkar û şovenîst bîn, gefên girtina partîyê dikarin bêne kirin û rastî êrişan bîn. Belê em ji bawerîya bi çareserîya demokratîk varê nabin û em dê rola xwe ya di vê oxirê da bileyizin...”

\*\*\*

## **Di Konferansê da Leyla Zana jî axivt:**

“Pirsa Kurdî ne pirsas asayîşî ye. Heta ku navê rastî lê neyete kirin, çareserî jî nemumkun e... Kuştina her huvîyetekê di eslê xwe da şerma cîhanê û mirovahîyê ye... Di sedsala 21an da hêj jî heke mirov ji ber axivtina makzimanê xwe bêne dadgeh kirin, li ser navê Tirkîyeyê wekî şermeke mezin qebûl dikim... Divêt giringîya rola Abdullah Ocalan bête dîtin û zanîn...”

\*\*\*

## **KNKYê li Berna Swîsê jî kombûnek organîze kir**

KNKYê 9ê Kanûnê li paytextê Swîs Bernê digel ronakbîrên Kurd kombûnek pêkîna. Serokê KNKYê Elî Yigit û serokê Kongreya Gel Zubeyîr Aydar jî beşdarî kombûnê bûn û

axivtin. Herweha endamên KNKYê Elî Matûr, Hikmet Çetin û Tahir Eldemîr jî di kombûnê da hazir bûn. Beşdarên kombûnê bang li rêvebirên Kurdîstana Federal kirin ku rê nedin fişara dewleta Tirk û cih û warên gerillayên HPGyê jî ablûka nekin. Herweha bang li Amerîka û Yêkitîya Ewrûpayê jî hate kirin ku nebin darûdesteyê dewleta Tirk. Kombûn bi banga yêkitîya neteweyî xilas bû.

\*\*\*

# **Dijî êriş**

## **16ê Kanûnê:**

## **Daxuyanîya**

## **KNKYê**

**Bo bîr û rehîya giştî**

## **Em êrişên dewleta Tirk rûreş û şermizar dikin**

Dewleta Tirk li dijî gelê Kurd ketîye nava şerekî qirêj. Ev proses ji 22yê Tîrmehê pêve dest pê kirîye û roj bi roj gur dibe. Ji destpêka meha Kanûnê were jî hêzên leşkerî yên dewleta Tirk li dijî Başûra Kurdistanê bi operasyonên hewayî û reşahî bombardumanê dike.

Roja 16ê Kanûnê hêzên hewayî yên dewleta Tirk li dijî gundên başûra Kurdistanê û wargehên Hêzên Parastina Gel [HPG] operasyon pêkînan. Bi xemgînîyê mezin hate bihîstin ku ji 15 zêdetir gund û hindêk jî wargehên gerîla hatine bombe kirin û di encama vê êrişê da du welatparêzên Kurd û 5 gerîla hatine kuştin. Em van êrişên dewleta Tirk rûreş û şermizar dikin.

Mixabin ev êrişên dewleta Tirk, yên ku ji hemû norm û bihayên mirovahîyê dûr, di bin bêdengîya dewletên rojavayê da pêkhatine. Di vî warî da kes nikare Dewletên Yekbûyî yên Amerîka [DYA] û Yekîtiya Ewrûpayê bêguneh bibîne. Heke dewleta Tirk ji van hêzên navneteweyî cesaret negirtiba nedikarî bi vî awayî li dijî Başûra Kurdistanê bombarduman kiriba.

Di van demên dawî da êrişên dewleta Tirk bi awayekî hovane li ser sazîyên demokratîk jî zêde dibin. Mal û

kargehên Kurdên li metropolên Tirkîyeyê bûne hedefa kampanya lînçkirinê. Wisa xuya dike ku, li cihê ku dewleta Tirk hewil bide pirsgirêka Kurd çareser bike, ew dixwaze bi êrişên îmhayî li ser gelê me terorê bimeşîne. Herweha dewleta Tirk bi Îran û Sûriyeyê ra jî tifaqa antî Kurd çêdike, bi alîkarîya hindêk dewletên herêmê yên Ereben paşverû dixwaze vê tifaqê berfireh bike.

Wisa tete zanîn ku ev êrişên dewleta Tirk hemû berjewendiyên gelê Kurd hedef girtine. Lewma reftara hêzên Kurdan yên li başûra Kurdistanê giring e. Lê belê heta nihe reftara wan zêde diyar nîne, lewma ev yêke me xemgîn dike. Bi vê munasebetê em bang li hêzên başûr dikin ku ew bêdeng nemînin û bi ruheke neteweyî bibizivin.

Em wekî Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê dibêjin ku Tirkîye û ertêşa wê nikarine Hêza Demokratîk ya Gelê Kurd. Divêt baş bête zanîn ku Hêza Rizgarîya Gelê Kurd pir bedelên mezin dane û bihayên giring afirandine. Pirsgirêka Kurd nikare bi êrişên leşkerî bête nîne kirin. Daxwaza dewleta Tirk ya “an teslîmiyet, anjî îmha” çu cara sernakeve.

Gelê Kurd jî her demî zêdetir li ser pêyan e û ji bo Rizgariya Demokratîk ditêkoşe. Dîsa jî em bangî hemû Kurdan dikin ku di van rojên dijwar da divêt li her deverê lê li ser pêya bin û van êrişên dewleta Tirk protesto bikin.

Bêyî zehmetî çu têkoşîn nayên meşandin û bêyî têkoşîn çu bihayên pîroz bi dest nakevin. Lewma KNK bangî xelkê Kurd dike ku hişyar bin, li ser pêya bin û dijî vê hovîtiya dewleta Tirk berxwedaneke mezin nîşan bidin.

### **Konseya Révebir ya KNKyê**

**17 Kanûn 2007**

\*\*\*

“... Bêyî zehmetî çu têkoşîn nayên meşandin û bêyî têkoşîn çu bihayên pîroz bi dest nakevin. Lewma KNK bangî xelkê Kurd dike ku hişyar bin, li ser pêya bin û dijî vê hovîtiya dewleta Tirk berxwedaneke mezin nîşan bidin...”

## **Reaksiyonên dijî operasyona hewayî ya 16ê**

### **Kanûnê:**

#### **KCK:**

“Dewleta Tirk berî vê êrişê jî bi dehan car erîş pêkînan û çu encamên li goreyî xwasteka xwe bi dest ve neînan û divêt baş bizane ku ji vê êrişê jî nikare encameke bi dilê xwe wergire. Yêk rê heye, ew jî li hember berxwedana bizava me, naskirina îradeya xelkê me ye... Dijî vê konseptê birandêr, xelkê me yê welatparêz dê hemû êrişan belav bike û çu astengên di rêya serkevîna da nas nake û di rêya Kurdistanê Demokratîk û Azad da û li ser şopa şehîdên xwe dê berxwe bide û serbikeve...” 17 Kanûn 2007 – Ji anf

\*\*\*

#### **Kongreya Gel:**

Serokê Kongreya Gel, Zubeyîr Aydar, bi daxuyanîyekê êrişa hewayî ya ertêşa Tirk bi xurtî protesto kir: „Eve êrişeke pêkveyî ye û armanc ne tinê bizava azadîyê ya xelkê Kurd e, timamî Kurd in. Çu kes bila xwe derveyî vê êrişê nebîne. Yê hatîye lêdan Kurd e, mirovê Kurd e. Bila rêvebirîya başûr [Kurdistanê Federal] xwe nexapîne, ew jî armanc in... Di serî da xelkê me yê başûr, xelkê me yê li hemû parçeyan, yên li derveyî welat û li metropolan divêt dijî van êrişan nerazîbûna xwe ya demokratîk nîşan bidin...” 16 Kanûn 2007 - Ji anf

\*\*\*

#### **PJAK:**

“Em wekî PJAK van êrişan şermizar dikin û hukûmet û ertêşa Tirk hişyar dikin ku ev êrişên wan bêbersiv namînin...” 16 Kanûn 2007 – Ji anf

\*\*\*

#### **DTP:**

Bi navê DTPyê Selahedîn Demirtaş daxuyanîyek da û wisa got: “Serokwezîr li milekê behsê vegera malê dike, li milê dî jî operasyonan dide kirin. Eve dijayetîyek e û dûrî hev e. Çu operasyon pirsê çareser nakin, bereks pirsê têkilav dikin... Operasyon rojekê zûtir divêt bêne sekinandin. Bawerîya me bi diyalogê û metodên demokratîk heye... Em operasyonê wekî çare nabînin...” 16 Kanûn 2007 – Ji anf

\*\*\*

#### **KON-KURD:**

“Em êrişa Tirkîye û Îranê ya di yêk demî da li ser warên medyayê yên parastinê, bi xurtî rûreş dikin. Herweha em

destekdayîna Amerika û Yêkîtîya Ewrûpayê jî şermizar dikin. Dîsa em li beramberî van êrişan sistmayîna hukûmeta Kurdistanê Federal jî rexne dikin...” 18 Kanûn 2007 – Ji anf

\*\*\*

#### **Mesûd Barzanî:**

“Êrişê hêzên Tirkîyeyê ya beramberî xelkê bêguneh yê Kurdistanê sêceki mezin e û li ser desthilata Iraqê jî daberizîn e û em bi xurtî şermizar dikin... Ez tînima bîra herkesê ku xwûna xelkê Kurd ewqas erzan nîne... Em hemû dizanin ku parastina esmanê Iraqê di bin berpîrsiyarîya Amerîkayê da ye. Heke Amerîkayê lambeya kesk vênexistiba, Tirkîyeyê nedikarî vê bombardumanê bike û vî sucî bike û xelkê bêguneh birîndar û şehîd nedikirin... Parastina navçeya Kurdistanê yêk ji erkên ehlaqî û huqûqî yên Amerîkayê ye. Xelkê Kurd jî vê reftara Amerîkayê aciz e...” 18 Kanûn 2007 – Ji anf

\*\*\*

#### **UN [Yêkîtîya Neteweyan]:**

Sekreterê Giştî yê UNê, Ban Ki-Moon jî nerazîbûna xwe diyar kir beramberî vê êrişê Tirkîyeyê ya li ser xelkê sivil yê Kurdistanê û endîşeyên xwe bi rêya çapemeniyê bi bîr û rehîya giştî ra gihandin. 18 Kanûn 2007 – Ji anf

\*\*\*

## **Bîr û rehîya demokratîk** [\*]

### **ROJAN HAZIM**

Bîr û rehîya demokratîk ya cîhanê bi giştî di pîrsa xelkê Kurd da, bi gotina herî nerm, îmtîhaneke baş nade!. Ji ber vê reftara paradoksal ya cîhana demokratîk mirov difikire ku xwezî ronakbîrên Kurd bi hev ra bangeke wisa kiriban:

Em bîr û rehîya demokratîk û humanîter û ”dewletên demokratîk” yên ku bihayên demokratîk bo xwe kirine armanç, belê di pratîkê da bereksî wê hereket dikin, rexne dikin. Dewlet û rêvebirîyên dîktatoryal, paşverû û faşîst jî sêcdar dibînin.

Boçî em van rexne û sêcdarîyan dikin?

Li rojhilatanavîn xelkekî bi navê Kurd, ku nezikî 50 [pêncî] milyon e, bê dewlet hatîye hêlan. Vî xelkê ku di

navbeyna çar dewletan da hatîye parve kirin welatek heye û navê welatê wan Kurdistan e. Piştî ku rejîma Seddam ji aliyê koalîsyona navneteweyî ya di pêşengîya Amerîkayê da ve ewil hate ablûka kirin û paşê jî hate hilweşandin, xelkê Kurd di parçeyê Kurdistanê yê di bin desthilata Iraqê da gihiştê azadîya xwe û îro di nav Iraqa Federal da, bi rêvebirîyê federal ya navçeyî xwe îdare dike. Kurd bi destvehatina vî giravê jîyana azad relatîven jî be dilşa ne û ji ber vê destekdayîne minetdarê bîr û rehîya demokratîk ya dinyayê ne. Lê belê, Kurdên ku di bin nîrê kolonyalîzma Tirkîye, Îran û Sûrîyeyê da hêj negihiştine azadîya xwe. Kurd li van welatan jî daku bigihin azadîya xwe têkoşîneke heq, meşrû û bi biryar didin. Rêvebirîyên van dewletan xwastekên Kurdan yên azadîyê bi metodên xwûnî ditepisînin. Têkoşerên azadîyê an dikujin, an bêseraşûn dikin, anjî bi cizayên herî giran hesf dikin.

Di nav van dewletan da Tirkîyeya ku xwe parçeyekî ”Dinyaya Rojavayê” dibîne heye. Li Tirkîyeyê nufûsa Kurdan nezikî 30 [sih] milyon e û ji van nezikî 20 [bîst] milyon li ser cografyaya xwe anku li Kurdistanê dijîn. Tirkîye hem endamê Natoyê ye, hem jî ber bi endambûna Yêkîtîya Ewrûpayê ve ye. Kurd li Tirkîyeyê bereksî hemû norm, krîter û bihayên demokratîk, ji hemû mafên xwe yên xwezayî û demokratîk hatine bêpar kirin. Perwerdeya bi Kurdî nîne. Kurdî wekî ziman hêj jî ne azad e. Gotina Kurdistanê qedexe ye. Bedelê hereketkirina bi şûra Kurdîtîya kolektîv bi dehan sal hefs e. Kurd bi navê xwe nikarin polîtîkê bikin û partîyên xwe ava bikin. Tirkîye li ser rêya endametiya YEyê ye, belê hemû mafên xelkekî 30 milyonî xesp kirine. Aha Kurd dijî vê hegemonyaya ceberrût têkoşîna azadîyê didin. Li ber vê rastîyê jî YE pêkve dijî van polîtîkên antî demokratîk yên Tirkîyeyê reftareke zelal û bi biryar nîşan nade. Amerîka jî herwisa. Kurd jî ber vê xemsarîya dînamîka demokratîk ya derve, bi timamî bi hêza xwe ya navîn dijî dewleta Tirkîyeyê têkoşîneke bi bedelên giran didin. Dewleta Tirkîyeyê tinê bi zulma li ser Kurdên li nav xwe namîne, destkevtên demokratîk û statûya Kurdên di nav Iraqa nû da jî, ku bi alîkarîya Amerîka û cîhana rojavayê ava dibe, qebûl nake û bi gefên operasyona leşkerî daberizîne li ser wan dike. Tirkîye hem li nav xwe, hem jî li navçeyê dijminahîya xelkê Kurd dike, mafê jîyanê nade Kurdan. Beramberî vê êrişê birandêr, Kurd bi hemû rê, metod û aletan hem têkoşîneke sivil û demokratîk, hem jî têkoşîneke çekdarî ya hindî hûn bêjin heqqane didin. Lê belê, YE û Amerîka naxwazin vê rastîyê bibînin, li tenîştê hêz û dewleta antî demokratîk cih digirin. Li ber vê rewşa paradoksal, em ronakbîrên Kurd li hember vê polîtîka we ya dobilmoralî isyanê dikin û bangî we dikin ku li biha, norm û krîterên xwe yên demokratîk xwudan derkevin.

Binêrin, di nîveka Balkanan da bi hevkarîya we Kosovaya du milyonî digihe azadî û serxwebûna xwe û em jî vê yêkê wekî mafekî xwezayî yê xelkê Kosovayê dibînin û destekê didîne û xelkê Kosovayê pîroz dikin. Li Kosovayê hejmara Tirkan çend hezar in [% 1] û bi navê etnîsîteya wan partîya wan [Partîya Tirk ya Demokratîk

Ya Kosovayê] heye, dikevin hilbijartinan û li parlamentê xwudan tensîl in. Zimanê Tirkî li navçeyekê jî be fermî ye. Partî [Partîya Demokrasîyê ya Kosovayê] û serokê [Haşim Taçî], ku li hilbijartina 17ê Teşrînê [Mijdarê] kar kirî ji hereketa leşkerî UÇKYê tîn, ku têkoşîna Rizgarîya Neteweyî ya Kosovayê didan.

Başê li Tirkîyeyê çi dibe? Îro li Tirkîyeyê partîya legal, DTP, [Partîya Civata Demokratîk], -hem jî di parlamenta Tirkîyeyê da xwudan grûb e-, ku bi navê xelkê Kurd têkoşîna azadî û demokrasîyê dide û digel ku navê etnîsîteya Kurdî jî lê nîne, girtina wê tete xwastin û herwisa provakasyon tene kirin ku rêvebir û endamên wê bêne lîç kirin. Herweha PKKya ku digel HPGyê jî bo maf û azadîyên xelkê Kurd û Kurdistanê têkoşîneke heq û meşrû dide wekî terorîst tete bi nav kirin. Em van polîtîka û refarên pratîk neheq û şaş dibînin. Em li hêvîyê ne ku YE, Amerîka û herkesên ku terefdarîya bihayên demokratîk û humanîter dikin, diji polîtîkên antî Kurd û antî Kurdistan yên dewleta Tirkîyeyê rawestin, pozîsyona xwe ya li Kosovayê, beramberî Tirkîyeyê jî nîşan bidin û li terefê têkoşîna heq ya xelkê Kurd û pêşengên wî cih bigirin. Ya rast ev e.

Gelo ma ne xwezî û daxwazeke mirovî, demokratîk û neteweyî ye ku bi hev ra bête bang kirin?

[\*] **Not:** Ji rojnameya Yeni Özgür Politika ya 15ê Kanûna 2007ê.

\*\*\*

«... Gerîlla ne di êrişê  
da ye, di pozîsyona  
parastina meşrû da ye.  
Yê ku di pozîsyona êrişê  
da ye ertêşa  
Tirk e û kuştîyên ku dide  
jî ji ber vê êrişkarîya wê  
têne dîtin...»

**KCK**

## **A. Ocalan:**

«... Reftara Kurdan ya demokratîzekirinê heke karî ku dewletê demokratîze bike hingê Komara Tirkîyeyê dê bête ser xeta me ya Komara Demokratîk ku eve damezrîna Komara Demokratîk e. Eve yêk dewlet û yêk demokrasî ye !. Heke eve neyête qebûl kirin anjî pêkneyêt, Kurd dê demokrasîya xwe li ser bingehê merkeza Diyarbekirê ava bikin. Otonomîya Azad û Demokratîk ya Kurdistanê !..

Min berê jî behsê Kerkûkê kiribû. Divêt cihek ji bo Tirkmen û Asûrîyan jî bête dan. Rengekî otonomîyê ji bo Kerkûkê jî dibe, lê belê **Kerkûk divêt di nav Federasyona Kurdistanê da be... »**



## KCK:

“... Kilîlê çareserîyê di çarçoveya van heft maddeyan da dibe:

1. Naskirina huvîyeta Kurd û di bin banê huvîyeta Tirkîyeyîyê û di nav makqanûnê da garantîkirina hemû huvîyetan,
2. Hemû astengên li pêşîya ziman û kultura Kurdî bêne rakirin, mafê perwerdeya makzimanî bête qebûl kirin û li navçeya Kurdistanê li tenîsta Tirkî, Kurdî jî wekî zimanê duyê yê fermî bête qebûl kirin, digel vê rêz li mafên kulturî yên kêmanîyên di bête girtin,
3. Li ser bingehê azadîya bawerî, raman û xwe îfadekirinê, mafê polîtîk û rêxistinî bête nas kirin, di makqanûn û qanûnan da, di serî da diskrimînasyona cinsî û hemû newekhevîyên civakî bêne rakirin.
4. Bi projeyeke lihevhatina civakî, bi armanca ku du civat hevdu aza [efû] bikin û aşî û azadîyê ava bikin, di serî da rêvebirîya PKKyê û hemû girtîyên polîtîk bêne berdan û rê li ber têkilbûna wan ya jîyana sosyal asteng neyên danan,
5. Hêzên ku ji bo şerê taybetî li Kurdistanê hatine bi cih kirin, paşve bêne birin û sîstemê ceşîtîyê [Korucutîya Gundî] bête belav kirin û ji bo ku gundîyên ku ji erdê xwe hatine bar kirin veqerine erdê xwe projeyên sosyal û ekonomîk bêne çêkirin,
6. Bi amadekirina qanûneke nû ya rêvebirîya navçeyî, desthilata rêvebirîya navçeyî bête xurt kirin,
7. Paralelî bi cih înanana van xwastekên li jor hatine gotin, bi qebûlîya herdu terefan prosesa çek danana gerîlla ya bi qonaxî bête dest pê kirin ku bi vî rengî têkilî jîyana qanûnî, demokratîk û sosyal bin...”

## Ji edîtor:

Sala 2007an bi hemû êş û jana xwe jî be, ji alîyê destkevtên neteweyî ve bi serkevtî xilas bû. Tête hêvî kirin ku sala nû, sala 2008ê jî bi serkevtinên mezintir ve tijî be.

Neteweyê Kurd bi hêvî ye û divêt vê hêvîya xwe di sala nû, sala 2008an da mezintir bike û têkoşîna xwe jî bilindtir bike. Bi vê bawerî û hêvîyê sala nû, sala 2008ê bila li neteweyê Kurd pîroz be...

Hejmara 5an ya KNK Bultenê dê di bihara sala nû da derkeve. Heta hingê bimînin di nav xêr û xweşîyê da...

\*\*\*

## “Konferansa Zimanê Kurdî”

“... Li ser biryara ‘Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKyê’ di meha Gulanê da ‘Konferansa Zimanê Kurdî’ tête kirin...”

"... Ez iddia dikim, projeya me ya çareserîyê ne zerarê dide tixûban nejî yêkpareyîya dewletê. Dîsa ve dibêjim, ev proje ne dewletê nejî milletî parçe nake. Ez vê yêkê ji vê derê bi vekirî dibêjim. Heke dibêjin bila xwûn nerije, ez hazirim ku bêyî ku dilopek xwûn birije çareser bikim. Min berî nihe jî got, heke îradeya hewce bête nîşandan, çî bikeve ser min ez dê bikim. Heke diyalog bête danan, hingê prosesa agirbesa domdirêj dê destpêbike. Heke hukûmet, bi taybetî serokwezîr ji dil dibêje bila xwûn nerije, divêt wisa bête kirin. Bi ya min jî mirina ciwanên 20 salî mixabin e û paşê milê ekonomîk jî heye. Ma dewleteke di ya ku ekonomîya wê hinde krîtîk û bi krîz heye? Deynê derve hatîye bi milyaran dolarî. Ji bo vî xelkî jî guneh e, vê yêkê heq nakin belê îradeya çareserîyê nîne. Ez dibêjim ku em vê îradeyê nîşan bidin, çî bikeve ser me em dê bikin. Piştî vê gavê ji bûn û bûyeran AKP berpirsiyar e, heke xwûn birije em ne berpirsiyar in, ku me jî gelek kuştî dan û jana me jî heye... Ez ji bo Kurdan Otonomîya Demokratîk ya Kurdistanê pêşniyar dikim..."

**Abdullah Ocalan**

**Rêberê KCKyê**

"... Tirkîye hem li nav xwe, hem jî li navçeyê dijminahîya xelkê Kurd dike, mafê jîyanê nade Kurdan. Beramberî vê êrişa birandêr, Kurd bi hemû rê, metod û aletan hem têkoşîneke sivîl û demokratîk, hem jî têkoşîneke çekdarî ya hindî hûn bêjin heqqane didin. Lê belê, YE û Amerika naxwazin vê rastîyê bibînin, li teniştta hêz û dewleta antî demokratîk cih digirin. Li ber vê rewşa paradoksal, em ronakbîrên Kurd li hember vê polîtîka we ya dobilmoralî isyanê dikin û bangê we dikin ku li biha, norm û krîterên xwe yê demokratîk xwudan derkevin.

Binêrin, di nîveka Balkanan da bi hevkarîya we Kosovaya du milyonî digihe azadî û serxwebûna xwe û em jî vê yêkê wekî mafekî xwezayî yê xelkê Kosovayê dibînin û destekê didinê û xelkê Kosovayê pîroz dikin. Li Kosovayê hejmara Tirkan çend hezar in [% 1] û bi navê etnîsîteya wan partîya wan [Partîya Tirk ya Demokratîk Ya Kosovayê] heye, dikevin hilbijartinan û li parlamentê xwudan temsîl in. Zimanê Tirkî li navçeyekê jî be fermî ye. Partî [Partîya Demokrasîyê ya Kosovayê] û serokê [Haşim Taçî], ku li hilbijartina 17ê Teşrînê [Mijdarê] kar kirî ji hereketa leşkerî UÇKyê tîn, ku têkoşîna Rizgarîya Neteweyî ya Kosovayê didan.

Başê li Tirkîyeyê çi dibe? Îro li Tirkîyeyê partîya legal, DTP, [Partîya Civata Demokratîk], -hem jî di parlamenta Tirkîyeyê da xwudan grûb e-, ku bi navê xelkê Kurd têkoşîna azadî û demokrasîyê dide û digel ku navê etnîsîteya Kurdî jî lê nîne, girtina wê têtê xwastin û herwisa provakasyon têne kirin ku rêvebir û endamên wê bêne lîng kirin.

Herweha PKKya ku digel HPGyê ji bo maf û azadîyên xelkê Kurd û Kurdistanê têkoşîneke heq û meşrû dide wekî terorîst têtê bi nav kirin. Em van polîtîka û reftarên pratîk neheq û şaş dibînin. Em li hêvîyê ne ku YE, Amerîka û herkesên ku terefdarîya bihayên demokratîk û humanîter dikin, dijî polîtîkên antî Kurd û antî Kurdistan yê dewleta Tirkîyeyê rawestin, pozisyona xwe ya li Kosovayê, beramberî Tirkîyeyê jî nîşan bidin û li terefê têkoşîna heq ya xelkê Kurd û pêşengên wî cih bigirin.

Ya rast ev e..."

**ROJAN HAZIM**

www.arsivakurd.org

---

**Adres:**

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê [KNK]  
Rue Jean Stas 41 / 1060 Bruxelles, Belguque  
Tlf.: 0032 2 647 30 84 / Fax.: 0032 2 647 68 49  
[www.kongrakurdistan.net/com/org](http://www.kongrakurdistan.net/com/org)